Rûbarê mezin

Nivêsîn: Arîf Elxetîb

Wergêran: Fehîma Îbrahîm Ebdulla

Çipkên baranê ji zîndana hewrê reş û tarî veristin û ber bi erdî ve hatin xwarê..
Çipkekê got:
- Çi xweşiyeka mezine, em ji zîndana hewrê reş rizgar bûn.
Ya dî bersiva wê da û got:
- Û çi mifa tê da heye, heger pîştî çendeka dî em dê bimirîn?
Çipka siyê xwe kire di ber re û got:
- Heger me bivêt bijîn, divêt em yek bigirîn û yekgirtin di navbera me da çêbibe.
Sîmayên çipkên baranê geş bûn, dengên pesendkirinê bilind bûn.
-Me divêt bijîn, em hez ji jiyanê dikin.
- Me nevêt bimirîn, em hez ji mirinê nakin.
- Me yekgirtin divêt.
Demê çipkên baranê ketîne erdî, hemûyan xwe nêzîk yek kir, bi sozdarî hevdu hembêz kirin, bi bawerî û viyan yek girtin, wesa rûbarekê bilqhavêj pêk hînan. Kenarên wî bi gulan xemildar bû.. Zarok çûne ber lêva û bi viyan gotin:
- Ev rûbare çendî ciwane?
Rûbar bû hevalê zarokan.. Yarî li nik dikirin û melevanî di çihên meyavên wî de dikirin.. Çipkeka baranê ya debeng got:
- Çend caran min bîhist zarokan digotin;
Ev rûbare çendê ciwane, lê kesê navê me çipkên baranê nehînaye, erê ew nizanin bêyî çipkên avê, çi bûhayê rûbarî nîne?
Çipkeka şareza bersiv da:
- Hevala min, me jî bêyî vî rûbarê mezin ewê me lêk kom ve dike çi bûhayê xwe nîne.
Ev axavtina te li nik min bi çi naçe û min biryar daye.

- Te çi biryar daye?
- Ez dê ji rûbarî cûda bim.
- Xweştiviya min we nekî.
- Bo çî we nekim?
- Ditirsim tu bimirî.
- Ez namirim.
- Yên bê hêz heger jêk vebûn dimirin.
- Ez ne ya bê hêzim.
- Tu çend ya rikoyî?

Çipka debeng ji biryara xwe nehate xwar, lewra bi ser kinarê rûbarî ket, barûveyekê lêda û digel xwe bir di nav pêlên bayê de hinçinî û pûç bû. Li roja dî, çipkeka dî jî ji rûbarî cûda bû, bi ser berekî ket, pîçleka germê lêda û sot berî bigehîte kinarê rûbarî.

Li roja siyê jî, çipkeka dî jî cûda bû, lê demê gehiştiye kinarê rûbarî, kerek bi lez dihat û bêyî xwe dana ser û pirçiqand û çi jê nehate dîtin..

Piştî hingî, çipkên avê baş zanî, bêyî hevgirtin ewan çi jiyan nabe, lewa çi çipkên dî bizava cûdabûnê ji rûbarê mezin nekir.